

Dema ku zarok nexweş dikevin – agahîyên liser parastina zarokan När barnet är sjukt – föräldrainsformation

Zarok ji mezinan zêdetir nexweş dikevin. Hiljimra tûşî bûna zarokên 0-4 salî ji nexweşîya çirka gevîyê, di salê da nêzî 6-8 cara ne. Çirk dibe sedema bihêz bûna pergala ewlehîya leşê zarokan. Ne gengaze ku çirk bi giştî bê tune kirin lê dibe ku berferhbûna vê bê girtin. Hûn wekî dayîk û bav xwe amade biken ku di her nivsalê da çend car di mal da zarokê xwe perestarî biken daku çirka wan bê çareser kirin û gengazîya veguhestina çirkê ji zarokê dî re kêmbibe.

Rewşa cismî a giştî a zarok, bi gotinek dî şêyana lîstina zarok di dibistanê da dîyar dike ku gelo zarok dikare di debistanê da beşdar be an na. Gengaze dêûbav di mal da nekarin nexweşîya zarok a çirkê bizanin lê di dibistanê da ku zarok gel zarokên dî û mezin sala dilîzin û dicivin, karmend dikarin rewşa nenormal a zarok dîyar biken. Mandî bûna zêdetir, bêrsî nebûn/kêmxewî û sergêj bûn nîşan dide ku nexweşîya zarok giran e. Ji ber vê pêwîste ku dêûbav bilez serdana dibistanê biken û zarokê xwe bibene malê. Karmendên dibistanê kiriyara zarokan vekolîn diken û eger rewşa zarok xirab bizanin, dibe ku dêûbav vekolîna wan balkeş bizanin. Eger dêûbav lise şandina zarokê xwe bo dibistanê dilnigeranin, dibe ku gel dibistanê pêwendî bigrin. Ji bo wergirtina alîkarîyê bijîşkî gel navenda saxlemîyê yan hejmara 1177 pêwendîyê bigrin.

Pêşniyar bo maweya ku zarokê pêşdibistanî di mal da ye:

- *Ta.* Dibe zarok herîkê 24 (bê bikaranîna dermanê tayê) demjimêra bêhna xwe vêde û paşê biçê dibistanê
- *Mandî bûn.* Eger zarokê ve bi qasekî mandî bûyê ku nikare di dibistanê da bixebite, dibe ku mal da bimîne. Bo mînak kêmbûna razana bi sedema kûxîn berdeham yek ji sedemên mandî bûnê ne.
- *Îshal / anku verêşan.* Zarokê ku tûşî îshal anku verêşanê dibe, herîkê dibe ku 48 demjimêra mal da bimîne daku rewşa xwarina wî/wê normal dibe.
- *Nexweşîyên dî yê çirkê wek birîna zer.* Dibe heya ku birîn dicebire zarok di mal da bimîne.
- *Maweya derman kirina pê antibiotikê.* Di dawîya maweya derman kirina xwe da sebir biken daku rewşa we a giştî baştir bibe û şopên wek tayê nemabin. Maweya derman kirina pê a herî kêmbûn du rojan dikşîne. Antibiotik û dermanên dî yê demî dibe ji alîyê dêûbav ji zarokan re bêne dayîn.

Hebûna xew û xwarîna baş ji bo başbûna rewşa zaroka pêwîste. Xebatên leşî bi taybet di heremê servekirî da, ji bo saxlemîya derûnî û leşî a zaroka bi mîfa ye. Kefî, kevîlê ajelan û amûrên dî ku ji dibistanê re tîn birin, dibe ku bîn şuştin .

Cîbecî kirina tendiristîya destan û girtina dev li dema bêhnişkê / kuxîne da yek ji pêşniyarên tendiristîyê di dibistanê da ye. Karmendên dibistanê bi başî rewşa çirkê di nava zarokan da nas diken û di maweya pêwîst da zagonên tendiristîyê tê bihêztir biken.

Agahîyên bêhtir

- Bo agahî ji kiryarên pêwîst bo derman kirina gevî êş anku guh êşê serdana ev malperê biken: www.1177.se
- Civata Giştî anexweşîyên hemîgir di dibistanê da: www.sos.se

Nivîsînek ji: Roj: Îmza:.....